# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (279):

## Mirina hemwelatiyekî ji kerba re, lêxistina xwendekarekî bi kêran, birîndakirina keçekê, girtinine bêsûcane, qutkirina darine zeytûnê, û pevçûnin li "Çadirgeha/Kampa Mehmediyê"







Ji bilî binpêkirin û tewanên têvel ên ku bi şêwakî fere û rêbazkirî di dermafê herêmê û xelkê wê de pêk tên, li ser bingeheke nijadperstî û bi sedema gotara kîndariyê ya di nav anîndeyan û Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" de belavkirî, pozquretî û dijayetiyên rojane -nayêne jimartin- li dijî Kurdan -nişteciyên resen û yên ji hemî çek û alavên berevaniyê bêpar/mehrûm- têne kirin, û piraniya wan rûdan û dijayetiyan aşkere nabin û nayêne belgekirin, bi sedema ferzkirina qedexekirina ragîhandinê li ser herêmê û tirsa yên ku dijayetiya wan hatiye kirin û herweha merivên wan ên li derve ji dengkirina li ser zordariyên ku digihêjine wan, da ku xwe ji dijatiyên zêdetir biparêzin û xwe ji sezakirinên sertir bidin yal.

**Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Mirina Hemwelatiyekî Kurd ji Qehra re:**

Piştî nîvro roja Yekşemê 11.02.2024an. Z, li dema ku Hemwelatî "**Cemal Mihemed Hemo** - zayîn 1970" - Gundê "Çê" tevî birayê xwe û sê kurên xwîşka xwe gihîşte nav zeviyeke xwe ye nêzîk Gundê "Gobekê" - Navça Mabeta, bi qutkirina darên zeytûnê nişkebû/hesiya, û ji du mêrên anîndeyên Gundewarê "Hemê" yên li wir pirsa yên weha kirine kir, lê wan bi tundûtûjî lê vegerand û bi qîreqîra merivine xwe (dora 15 kesan li çadirgeha "Avrazê" yê nêzîkî zeviyê rûdinin) anîndindan, bi ço û keviran êriş ser her pêncan kirin, pêya/piya yekî şikandin û govdeyên ên din jî derizandin û êşandin, û piştî dijîkirinê bi dora bîst kêlîkan û vegera yên dijayetiya wan hatiye kirin G. "Gobekê", "Cemal" ji qehra û fişara ku hatiye ser re bi seknexwînê ket, û di

encamê de di cih de mir, û birina wî bo nexweşxaneyeke Efrînê sûde lê nekir; Û li roja din termê wî di goristana gund de hate binaxkirin.

Were bîranîn ku yên dijayetî li ser wan hatiye kirin û nejî xwediyên ê vêguneh/bêsûc miriye tu gilî yan doz dijî dijberan li ba Destlatên dagîrkeriyê yan jî Milîseyên "Lîwa'i El'şemal" (yên ku gund desteser dikin û biryargeheke wan e rêvebirinê lê heye) venekirin, ji tirsa ku rewş pîstir bibe û rastî tewanên qirêjtir netên. Û wan aliyên destlatdar jî tu lêkolîn li ser bûyerê çênekirin.

**= Lêdana xwendekarekî Kurd bi kêran:**

Li 25.02.2024an. Z, li dibistana navendî li Bajaroka Mabeta, di dema kar a fermî de, çar xwendekaran -me nikanî navên wan bi dest bixistana- ji zaroyên anîndeyên herdu Gundewarên "Heleb û Hemê" bi armanca kuştinê bi lêdan û kêran -yek jê sungiya çekan bû- li hevalê xwe yê pola yazdehan xwendekarê Kurd "**Şiyar Ibrahîm Umer** /17/sal" ji xelkê Gundê "Qenterê" yê hevcîwar xistin, di encamê de bi kûranî birîndar bû, paşê rakirin nexweşxana "Amenos" li Efrînê û xistin lêsekirina guvaştî/înayê muşededê, ta ku jiyana wî rizgar kirin û ji mirinê filitandin, û ta niha di nivînan de ye; Herweha wê giropa bi bedbûn û pîsîtiyê naskirî li mamostekî (ye ku hewil daye ku yê dijayetî li ser hatiye kirin rizgar bike) û xwendekarekî din - hevalê "Şiyêr"- xistin.

Û Milîseyên "Asayêşa Sivîl li Mabeta" rabûn ewên dijayetî kirine girtin, û bi ser de jî çar Xwendekarên Kurd (yek jê "**Ferhad Henîf Mihemed**" ji G. "Qenterê" û sisê "**Gîvara Ibrahîm Mihemed, Mihemed Elî Cimkî kurê Hisên, Mihemed Ridwan Mistefa**" ji Gundê "Ereba" yê hevcîwar), da ku lêkolînkirinê yanbadin, dozê şebeq/tevlihev bikin, û tewanê li ser ên kiryar kirine sivik bikin.

**= Birîndarbûna hemwelatiyeke Kurd:**

Li êvara 29.02.2024an. Z, di encama topebarankirina Artêşa Turkiyê û Milîseyên Sûrî yên bi ser ve ji Gundê "Soxanekê" - Çiyayê Lêlûn re (yê ku di bin desteseriya Artêşa Sûrî de), perçe hesinin li zikê Keça Kurd "**Emîne Hikmet Mihemed** /19/sal" -di hundir mala wê de- ketin; Herweha du endamên Artêşa Sûrî jî bi têvelî birîndar bûn, bi ser de jî ziyan gihîşte malina.

**= Girtinine bêsûcane:**

- Li vê dawiyê dadgeheke Turkiyê li Stanbûlê cezakirina şeş sal hepis da Hemwelatî "**Şêxmûs Xelîl Îsma'îl** /30/sal" ji Gundê "Penêreka" - Navça Reco, bi tewanbariya/tuhmeta endamtiyê ji hêzên Rêvebiriya Xweser (RX) a berê re, ji berî dagîrkirina Efrînê; Were zanîn ku ew li 02.10.2023an. Z ji ciyê rûniştina wî li gel dê û bav û malbata wî li Istanbûlê hate girtin, û xwediyên wî jî ji sala 2013an ve li wir rûniştine.

**Û destlatên dagîrkeriyê ev girtin:**

**-** Li 15.02.2024an. Z, Hemwelatî "**Ehmed Umer Silêman** /52/sal û kurê wî **Mistefa** /26/sal" ji xelkê Gundê "Şêxûtka" - Navça Mabeta, ji mala wan li Taxa "Efrîna Kevin", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ve, û dest danîn ser dora /2.5/ zêr ji dîkana wan (Cewherên Silêmên), bi tuhmetên çêkirî, û piştî du heftan ji girtina bêsûc ew berdan.

**-** Li 15.02.2024an. Z, Hemwelatî "**Zehîde Hemze Emîn** /70/sal, **Mehmûd Elûş** /85/sal, **Hesen Sebrî** /60/sal, **Şêx Mihemed Şêxo** /75/sal, **Silêman Xelo** /80/sal, **Ezet Xelo** /65/sal, **Ehmed Xelo** /80/sal, **Mihemed Oso** /70/sal, **Ehmed Mihemed Oso** /36/sal" ji xelkê Gundê "Axcelê" - Navça Cindirêsê, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" ve, bi tewambariya têkeliyê bi (RX) a berê re, û heyşt jê berdan piştî ferzkirina vêrgiyeke diravî -hezar Dolar Emrîkî- li ser her yekî ji wan, ji bilî "Ehmed Mihemed Oso" yê ku ta niha bêsûcane girtî ye; Û bê bîranîn jî ku piraniya wan berê jî carekê hatine girtin.

**-** Li navîna Reşmehê/Sibatê 2024an. Z, Hemwelatî "**Edîle Ebdo Hemadê** /65/sal" jinebiya Dilovanber "Reşîd Heyder" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna", ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, bi tuhmeta têkildariyê bi (RX) a berê re, û piştî rojekê hate berdan, bi merca dandina baceyeke diravî /400/Dolar Emrîkî; Û berê jî ew rojekê rastî bendkirin û baceyeke qaserî /500/ Dolar hatibû û bi heman tuhmetê, bi ser ku ew pir perîşan e û li ser alîkariyan dijî.

**-** Li 19.02.2024an. Z, Hemwelatî "**Idrîs Mihemed Bekir** /47/sal" ji xelkê Gundê "Goliyê Jêrin" û "**Rif'et Mihemed Elî Reşît** /50/sal" ji xelkê Gundê "Goliyê Jorin", ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, bi tuhmeta têkildariyê bi (RX) a berê re.

**-** Li 25.02.2024an. Z, Hemwelatî "**Ebid El'rehman Ke'irik/karik** /50/sal" ji xelkê Gundê "Bilêlko" - N. Reco û li Bajaroka Reco jî rûdine, ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Reco" ve, li dema seredana wî ji navenda asayêşê re, da ku lawê xwe "**Hemîd** /25/sal" (ê li 21.02.2024an. Z bi tuhmeta têkildariyê bi (RX) a berê re hatiye girtin) bibîne, û herdu jî ta niha bêsûcane girtî ne; Û berê jî "Îlham Ebid El'rehman Silêman - hevjîna Ebid El'rehman" du mehan -di navêna Avdar û Gulana 2022an. Z de- girtin, û piştî ferzkirina baceyekê li ser hate berdan.

**= Qutkirina darên zeytûnê:**

Li 05.02.2024an. Z, Milîseyên "Ceyş El'şerqiyê" rabûn heyşt darên zeytûnê ji zeviyeke Hemwelatî "**Isma'îl Misto**" ji xelkê Bajaroka "Kefirsefrê" qut kirin, bi armanca êzinigkirin û bazirganiyê.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

Li 25.02.2024an. Z, û di encama nelihevkirinê de, li ser destdanîna ser erdê kesekî koçber ji nişteciyên resen li nêzîk Gundê "Mehmediyê" - Navça Cindirêsê, pevçûnek û avêtina qurşînan di navbera du giropên anîndeyên li "**Çadirgeha/kampa Mehmediyê**" rûniştî de çêbûn, ew herdu girop jî endamên Milseyên "Ceyş El'nesir" û "Nûr El'dîn Zenkî" ne, û di encamê de û ji herdu aliyan hin hatin kuştin û hin jî birîndar bûn.

Di siya tunebûna ewlehiyê û zagonê û filtandina ji sezakirinê de, binpêkirin û tewanên têvel û cûrbecûr berdewam dibin, û ta niha dûdan û lêpirsîna li ser wan binpêkirin û tewanan li Efrîna dagîrkirî ji aliyê Turkiyê ve tu hêvî jê tune ye.

03.03.2024. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Miriyê bêsûc "Cemal Mihemed Hemo".
- Xwendekarê birîndarkirî "Şiyar Ibrahîm Umer".
- Topebarankirina Gundê "Soxanekê" - Çiyayê Lêlûn, êvara 29.02.2024. Z.
- Qutkirina darine zeytûnê yen "Isma'îl Misto" - Bajaroka "Kefirsefrê".